

Partiyek siyasî û
bizaveke neteweyî a
mafîxwazane

»»» R:7



Di hêla hilûşîna
navendê de

»»» R:3



Tirsa Zordar

»»» R:2



Sûriya ji nexşeyeke
naskirî berbi
nexşeyên nediya

»»» R:8



*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

*Duhestînameyek Siyasî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (379) 06-08-2020 Buha (1000) Tûmen*

Samana Îranê di pêxema şewitandina Kurdistanê de

Rêketa 13`ê Gelawêjê malpera “Kurdistanmedia”yê di nûçeyêke bilez de eşkere kir ku li berde-wamiya cinayet û destdirêjîyên rejîma Îslamî ya Îranê bo ser axa Kurdistanê, Spaha Pasdaran deverên çiyayî yên Kurdistanê topbaran dike.

Di vê nûçeyê de hatibû: Saziya Spaha Pasdaran a terorîst a rejîma Îranê, demjimêr 12`ê nîvro bi dema Rojhilatê Kurdistanê, bi balafirên bêpilot û mûşekan bi awayekî dijwar deverên çiyayî yên Kurdistanê, bin-keyên Hêza Pêşmerge û cihê akinciyên xelkê asayî topbaran dike.

Eva rohn e ku re-jîma Îslamî ya Îranê çendîn sal e ku bi bê berçavgirtina nigeranî û givaş û dorpêç û cezaya welatên cihanê û Saziya Netewên Yekgîrî bo ser xwe û hevvelatîyên xwe, mûşekên cur bi cur ji welatên wekî Koreya Bakur û Çîn û Rûsiye dikire, yan bi sedema ew teknolojiyên ku bi dahata xelkên Îranê kiriye, wan diceribîne. Hewlek ku nemaze di du dehikên derbasbûyî de bileziyeke zêde bi xwe ve girtiye, û di heman demê de nig-

eraniyeke zêde ji aliyê welatên cihanê û ne-maze hin aliyên wekî Amerîka û Îsraîl û Erebiştanê pêk aniye.

Di encama êrîşa wê carê ya Spaha Pasdaran a terorîst bo ser çiyayên Kurdistanê de, mixabin rêjeyeke berçav ji rez û bax, jîngeh û sirûştê Kurdistanê hate şewitandin û ji nav çû; Ew êrîşa rejîmê herçend yekem car nîne tê encamdan, û berê jî kiryar û hewlên bi wî awayî di gorê de bûn, û bi dûr jî nayê zanîn ku di paşerojê de, hewlên wê yên tirsinokî yên bi vî awayî berde-wam bin, lê di hundirê xwe de hilgirê pey-ameke girîng e, û ev jî heqîqeta xwestek û daxwazên gelê Kurd e, ku serkutkarên cemawer nekarîne û nikarin bibînin, û bi vê yekê îtirafê bikin.

Mûşekbaran û katiyûşabaran û topbarana çiyayên Kurdistanê pêş vê ku nîşaneya deştilat û şiyana deştiladaran berteng be, nîşaneya neşiyaniyê û tirsê wan ji îradeya neteweyekê ye ku dixwaze bi azadî bijî.

Heyama zêdetir ji sê sal e ku Rojhilata

Kurdistanê ber bi qonaxeke nû ya xebatê qonaxa Rasanê ve pêngav avêtiye. Rewşa zemanî û navxweyî û deverî û cihanî di wê demê de û ji bilî vê jî di sê salên derbasbûyî de bi pêwîst hate zanîn ku ew şêwe xebate di Rojhilata Kurdistanê de bê deştêkirin.

Her çawa ku me dît ev xebate ji aliyê xelkê Rojhilatê Kurdistanê ve pêşwazî jê hate kirin. Her ji roja yekem ve rejîmê ev biryare bi girîng wergirt û kete gef û hereşeyan li partiyên Kurdî û tirsê pê ve xuya bû. Axûndan piştî ragihandina “Rasan”ê her zû û bilez biryara “xendiqandin”! jinavbirin! an heta hewla lawazkirina wê dan, û ji bo îsbata wê jî biryara xwe bi awayekî piratîk cî bi cî kirin, û ji encamdana ti cinayetekê li hember îradeya wê partiyê xwe neparastin, ku dawî mînak mûşekbarana 13`ê Gelawêjê li çiyayên Başûrê Kurdistanê ku wek îşare pê hate kirin bi wê sedemê, xelkê deverê û yên sivil yên deverê rastî xisaran hatin.

Komara Îslamî bi sedema şaşbîrkirina xwe, wisa dizane ku pêşmerge û xebatkarên Kurd tenê di çiyayan de ne, û bi têngihîştina xwe dixwaze bi wan pîlanên xwe yên bi dizî ve Kurd û xebatkarên ji yektir cuda bike! Agehdarê



vê yekê nîne ku riha şoreşvan û berxwedan û xebat di nav hundirê takê Kurd de ye, û çî li çiya be yan li bajar be.

Eva ku Komara Îslamî li hember çiyayên Kurdistanê dike, hewleke bo temirandina hesta sadîsmî û berde-wamiya kolonyalîzmê. Çimkî Kurd wekî darberoyên nîştîmanê hîn bûne ku giran û qahîm û rîşedar bin, û bi bahoz û ba netewin (neçemin), û bi agir neşewitin, û hekî jî hatne şewitandin, hewl bidin cardin çilo bidin û şîn bin.

Sergotar

Tirsa Zordar



N: Kerîm Perwîzî

Di wê demê de ku her tak an jî sistemek rastî metirsiyê tê, şewaza bersivdan bi metirsiyan û gefan, nikare ji pêkhatiya hundirî wê takê yan wê sistemê dûr be.

Bi vê wateyê ye ku nabe gefeke maddî yan nexweşiyek ku xerceke madî ya zêde heye, pêşîra mamosteyekî/ê zanîngehê bigre, û berteka wî/ê mamosteyî/ê ev be ku li ser bankekê de bigre, û pereyê wê bidize! Her di heman demê de nabe heman metirsî pêşîra çeteyekê bigre û te çavnehêriya vê yekê hebe ku ew çete here îdareya kar û daxwaza kar bike, da ku pareyê nexweşiya xwe bi dest ve bîne!

Sîstema koloniyalîstî jî berevajî sistemeke xelkî di demên krîzan de helwestê digre, û helwesta her yek ji wan, ji sîstem û pêkhatiya hundirî ve çavkaniyê digre.

Dema ku sîstema xelkî rastî krîz û arîşan tê, ji rêya yasayan ve hewla çareseriyê dide, û dema ku her çareser nebû, hawara xwe dibe ber dengê xelkê, da ku di hilbijartinên din de kesane din û bernamayan din bipejirînin. Di sistemeke koloniyalîstî ya wekî Komara Îslamî de berdewam wekî koloniyekê çav li derdorê dike, û xwe wekî koloniyekê din dibîne. Ji aliyekî ve hewl dide ku dubare axayekî din peyda bike, û bibe xulamê wî axayî, û wisa dizane ku hemû cihan li ser bingeha koloniyom yan xwediyê kolonîbûnê dizivire, û ger axa û koloniyalîsteke wekî Bîrîtaniya ji

dest daye, dibe here Çînê peyda bike, da ku “Weliyê Feqîh” xulametiya alaya sor ya komonîzma Çînê! bike.

Di heman kiriyara du cemserane de jî, dema ku Amerîka û Îsraîl bi berdewmî hêzên Spaha Pasdaran li deverê dikujin û bordoman dikin û heta di nav Tehranê de binkeyên “Parçîn û Netenz”ê jî dikin armanc, ew sîstema kolonîlîstî bixwe nayê, da ku bêje ez nikarime Îsraîlê, belkî çimkî bingeha bîrkirina wê li ser “jêstgirtin”êke bêçine û vala hatiye avakirin, bo qerebûkirina wê sivikaytiya leşkerî ya ku pê dikin, dibe karekê bike, û nikare şerê rastewxwe digel Amerîka û Îsraîlê bike!

Di wê haletê de ji bo qerebûkirina ew sivikatiyên ku bi wê hatine kirin, û hîloşîna abrû û hetikekê ku di rastî de her wê tune, êrîş dike ser kesên lawaz û kêmhêz, û dixwaze tola şikesta hundirî ya xwe bi destbilindkirin li bêhêz û bindestan hilîne, yan tola xwe ji wa kes û aliyan hilîne, ku bi salan e, li wan kindar û dax li dil e. Roja 13`ê Gelawêjê, çend rojan li pey hemû teqîn û wêrankariyên li binke û padiganên Spaha Pasdaran di çend cihên Îranê de, Spaha Pasdaran bi mûşek û top û katiyûşayan cardin çiyayên Kurdistanê daye ber agirê kerb û kîna xwe, û xisareke zêde gihande sirûşt û dahata Kurdistanê û xelkê deverê.

Sîstema koloniyalîstî wekî desthilata cihgirtî li Tehranê, li ber valakirina kîna xwe ya derûnî, û bo veşartina şikestên xwe û veşartina tirsê zêde ji neman û herifîna sîstema xwe, bi çend mûşek



û topan Kurdistanê dike armanc; lê tenê û tenê îsbat dike, ku ew sîstema kavihbûyî edî Tu derfeteke wê bo manê nemaye, û hemû gurregir û hawara wê bo vê ye ku, di tenêtiyê de asê bûye, û dixwaze dengvedana gurregurra xwe bibihîze!

Di hêla hilûşîna navendê de



N: Mistefa Hicrî

Piştî şoreşa gelên Îranê (1979), herçiqas pêkhateya desthilata paşayeti ji aliyekê ve hilûşîya, lê binaxeya sitema neteweyî û perawêzxistina netewên bindest ên din li ser bingeha oştûreya Îrana baştan û îdolojiya mezhebî ya Şîe û Fars, şewazeke nû bi xwe ve girt.

Di detpêka wê qonaxê de, navend car din xwe pênas kir û rehendên tundûtîjî û jina- navbirin û serkut, bi awayekî sistematîk berfireh kir.

Encama siyaseta înkarkirin li hebûna netewan, heta hewil- dan bo kêmkirina wan û heta asta qewareya qewmî û hûrde çand, eva bû ku mafê jiyan, mafê azadî, pirs- a serwerî ya netewan, pirs- a demokrasî û heta azadiyên destpêkî, bî dîdeke ewlehî û gef bo ser asayîşa neteweyî mîze kiriye. Ev dîdgahe jî, di rastî de bûye metirsî bo ser- man û asayîşa neteweyî ya netewên sitem lê kirî.

Tundûtîjî û serkuta sistematîk, hemû warên jiyanê asteng kiriye. Li Rojhilata Kurdistanê, ew tundûtîjiyane bi fermana cîhada Xomênî, avaker û rêberê Komara Îslamî, li jêr navê şerê pîroz, bi hênceta ayetên Quranê û baskirina Îslamê, deest pê kir, ku heta niha jî berdewam e û heta re- hendên şereke nerim jî ji xwe ve girtiye û bûye stratîjî û siyaseta fermî ya mîratgerên Xomênî.

Cudahiyekê ber çav a wê tundûtîjiyê li Kurdistan û herêmên din ên Îranê wiha ye, ku hekî li cihên din ew

xelkên ku bi neyar û cudabîr dizanin, rastî êrîş û hepsîki- rin, îşkence û îdamê tîn, di Kurdistanê de jî hevşeweyên wan xalan, dîrok, nasname, kultûr, ziman û bi giştî jîngeha netewa Kurd rastî êrîşekê hemû alî ye ku dawî armanca navendê, helandin û bêdengîkirina rizgarîxwaziya Kurd bûye.

Rewşa niha ya Kurd û rewşa Navendê

Tevî jîngeha daxistî û bi ewlehîkirî û rewşa serkut û tundûtîjî li Îranê bi giştî û bi taybetî di Kurdistanê de, li pêwendî digel armancên xwe li navxwe û derveyê welat bi bimbêst gihîştîye.


Wek behskirin li ser wê siyaseta şikestxwarî, ez wisa dizanim ku rejîm li siyasatên xwe li hember bi yekeya netewa Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, her ji destpêkê ve bî encam maye.

Hêviya azadî û gihîştin bi mafê neteweyî ku heman serweriyên Kurd e bi ser axa xwe de, berdewam û rû li geşekirinê ye. Pêdagirî li ser nasnameya neteweyî, gawhera tevgera neteweyî û demokratîk ya Kurd bûye. Berengarî û berevaniya neteweyî, rê nîşanderê wê tevgerê bûye.

Dagîrkariya rejîma Îranê jîngeha Kurdistanê ber bi jinavbirinê ve biriye çavkani- yên avî û kaniyên wê bi merema avedankirina nav- endê talan kiriye. Herwisa di niha de naberanberiya civakî bi sedema siyasatên çewt ên rejîmê, civatgeha Rojhilatê ber bi civatgeheke neyeksan û tijî li teperî ve biriye. Hej- mar û asta hepsiyan, şehîdên jîngehê û serkuta dengê jinan û xwendekaran û çalakvanên medenî, îdam kirin û teror û bêsêrûşûnkirin û tepeserî, hekî çî evane belgen bo îs- batkirina tawanên rejîmê, lê di heman demê de, nîşaneyên berdewam bûn û xweragiriya wê neteweyê ye ku serê xwe li hember zilim û stem û

bindestî netewandiye.

Li derheq rewşa giştî ya Îranê, rejîma Komara Îslamî di dîdgeheke giştî de wek dewleteke şikestxwarî bi he- jmar tê ku şiyana îdarekirin û birêvebriya welat nemaye. Heger jî şiyana mabe girêdayê ye bi razandin û bikaranîna hêza serkut û leşkerî di navx- we û derveyê welat de. Şik di wê de nîne ku rejîmeke “nemûtearif” a wekî Komara Îslamî bi sedema komek krîzên komêserhevbûyî û pir-



sa çaresernekirin di navxwe û derve de hatiye dorpeşkirin.

Gendelî û tawanên hikûmet û desthilatdaran, asta xelkê ner- azî, dengê şeqaman, givaşa bîkarî û nebûna derfeteke jiyanî asayî bo piraniya xelkên Îranê û sedan arîşeyên din, rejîm ber bi bimbêstekî îdarî û berêveberî ve biriye. Ew rewşa wisa kiriye ku mafê jiyanî detpêkî di wê welatê de neyê misogerkirin. Belkî krîz wateya sereke be ku bo lêkdana rewşa bimb- estî ya niha alîkar be. Krîz li birêveberî, krîz li siyaseta navxweyî û li siyaseta derveyî, rejîm xîstîye nav tengahiyê, bi curek ku krîz bi krîz bi rê dike.

Eger Komara Îslamî di hewlê de ye wekî aliyeke “hêjmunî” ya deverê, hewze û bin- keyekê bo xwe pênas dike, lê bi sedeme kempeyna ceza û dorpeçên Amerîkayê, bî şiyana maye û pareke zêde ji çavkaniyên darayî û hewal- gîrî û leşkeriyên wê, heta

di asta hevalbend û girûpên girêdayê Komara Îslamî di Îraqê, Sûriye, Lubnan û Yemenê de ku mijûlê şer in bo rejîmê, rastî krîzê hatine; Bi taybetî ku niha, wekî berê dabînkirina bûdceyê bo girûpên çekdar ên girêdayê xwe nemaye û hemû rastî astengiyan hatine. Bilî wê fakterê, di welatên wekî Îraq û Lubnanê de, li dijî mudax- ilekirina Îranê di nav welatên wan de hatine ser şeqaman û daxwaza derxistina hebûna Îranê di welatê xwe de dikin.

Li welateke wekî Sûriye ku Îran bi hewzeya nifûza xwe zaniye, di heyama du salê derbasbûyî de bi dehan û sedan car binkeyên leşkerî û berjiwendiyên wê bûne armanc û bilî dermankirin, şiyana berevaniyê li xwe nemaye.

Çavkaniyên cihê baweriyê îşare dikin ku ew êrîşane ji aliye Îsraîlê ve tê kirin; Welatek ku hertimî rastî gefxwarina berpirsên rejîmê hatiye û silogana reşkirina wê welatê li ser cugafiyayê didin. Heta ew êrîşane li ser axa Îranê jî dîbare dinin û binke û damezrawên etomî û leşkerî û stratîjiyên dibine armanc.

Rejîmek ku hêviya wê avaki- rina “Em El-Qura” a Îslamî di deverê debû, di heyama dîroka xwe de bi wê astê lawaz û bê deretan nebûye.

»»» Doma R:3

Rewşek ku li dever û li nav hin welatan de di gorê de ye, encama siyaseta fitneyî û pîlangêrî û mudaxilekirina rejîmekê ye ku niha ne tenê bi xwe, belkî Îran jî bi xwe ve mijûl kiriye. Rejîmek ku saman û dewlemendiya welat kir bi xercê şandina şoreşê, niha çavnhêrê şoreş û serhildana qurbanîyên wê siyaseta xwe dike ku xudê xelkê Îranê ne. Her wekî ku di heyama wan çend salên derbasbûyî de mencên kîn û kerba xelkê bêzarbûyî yên wê welatê, hebûna rejîmê heta sînore (pêka

gotina xudê berpirsên rejîmê) erdhejeke siyasî û şoreşa seraserî biriye.

Di wê rerwşa krîz de, meydana çêbûna serhildan bo nerizayetiyan zêdetir e û hevdem metirsiya serkuta zêde jî tê pêşbînîkirin. Niha ku bêbawerîbûn bi hikûmetê û bêhêvîbûn bi jiyana asayî wekî sîberekê tarîtiyek bi ser wê welatê de hatiye û çavnhêriya ti çareseriyekê bo nayê kirin, rejîma Komara Îslamî, bo mana xwe amadeyê hemû core tundûtîjîyek û serkut û nirxekê ye. Îşarekirin bi wan amadekariyan li derheq Kurdistanê rohtir e. tenê di

7 mehên derbasbûyî de, 92 kes li Rojhilat bi tohmata çalakiyên medenî, siyasî û mezhebî, ceza bi ser wan de hatiye sepan-din. Îdama Hidayet Ebdulahrû, Sabir Şêx Ebdulah û Diyako Resûlzade û cezaya hepsa dirêj heyama bo Husên Usmanî û Zara Mihemedî û berê jî cezaya hepsa heta hetayî bo Zeyneb Celaliyan, tenê çend mînakik in.

Lê dîroka Komara Îslamî îsbat kiriye ku ew siyasetên çewt û tundûtîjîyane hawara wê de naçin. Bi berdewamiya dehikên derbasbûyî, Kurd li Rojhilat xwe wekî neteweyekê bê hakimiyet bîniye. Her di vê derheqê de jî yek ji armanca sereke, siyaseta serkut û asmîlasiyona navendê bûye. Di vê derheqê de, bi pêdagirî li ser misogerbûna serweriya xwe bi ser axa xwe de, tekezê jî dike ku nîşaneyên “demokarsî” û bingeha pêkhatina desthilat û herwisa wateya civategeha Îranê, dibe ji nû ve bêne pênasekirin. Bi bê wê pênasekirinê, ew core sîstema dagîrkariya navxweyî a wê berdewam dibe, her lewma ew core pêwendîya dagîrkerî, dibe li destpêkê li navendê berifin, heta rê bo bi hev re jiyana dilxwazane û aştiyane bê amadekirin. Bo wê armancê, Kurdistan li ser pê dimîne û bo gihîştin bi serwerî û pêçandina Komara Îslamî nirxeke zêde dide.

Hevpeyvînek li derheq 75emîn salvegera avakirina PDKÎ, digel Şarezayê Dîroka Kurdan û Nivîserê Bakurê Kurdistanê “Se’îd Veroj”



Se’îd Veroj: PDKÎ wek partiya pêşeng û damezrênera Komara Kurdistanê, em dikarin bibêjin ku li çar aliyên Kurdistanê bandoreke pirr girîng li ser peydabûn û geşbûna hişyariya neteweyî kiriye.

Hevpeyvîn: Keyhan Mihemedîniyad

P: Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, di dema avabûnê de heta niha çi bandorek li ser hişyariya neteweyî ya gelê Kurd li her çar parçeyên Kurdistanê danaye?

B: Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê (PDKÎ), beriya 75 salan di pêvajoya Şerê Duyemîn ê Cîhanê de, bi serokatîya Pêşewa Qazî Mihemed di 16ê Tebaxa 1945an de li bajarê Mahabadê hatiye damezrandin, li Rojhelatê Kurdistanê pêşengiya têkoşîna rizgariya neteweyî ya Kurdistanê kiriye û ji damezrandinê şûn ve piştî pênc mehan (mangan) di roja 22/01/1946an de bûye partiya damezrêner a Komara Kurd-

istanê. PDKÎ, partiya pêşeng a damezrênera Komara Kurdistanê ye. Damezrandin û çêbûna Komara Kurdistanê, di dîroka nêzik a Kurdistanê de, rûdan û destkevta herî mezin a neteweya Kurd e. Bêguman ked û têkoşîna kurdên çar aliyên Kurdistanê di vê pêvajoyê de heye, lêbelê nîşandana vê îradeya siyasî û neteweyî, bi pêşengiya PDKÎ pêk hatiye, ji ber vê yekê dema ku behsa hişyariya neteweyî bête kirin, wek partiya pêşeng û damezrênera Komara Kurdistanê, em dikarin bibêjin ku li çar aliyên Kurdistanê bandoreke pirr girîng li ser peydabûn û geşbûna hişyariya neteweyî kiriye.

P: Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, 75 sal beriya niha Komara Kurdistanê avakir, gelo PDKÎ çi bandorek li ser hişyariya siyasî ya parçên dinê yên Kurdistanê danaye?

B: Çawa ku di bersiva pirsê beriya vê de jî hate diyarkirin, Komara Kurdistanê, di roja 22/01/1946an de hate damezrandin. Her çiqas temenê Komara Kurdistanê nêzîkê salekê be jî, ragehandina Komara Kurdistan (22/01/1946), di dîroka siyasî ya hemû Kurdistanê de

pêngaveke pirr girîng e. Di sedsala biştan a dîroka siyasî ya neteweya Kurd de, rûdana herî girîng, ragehandina Komara Kurdistanê ye. Vê rûdanê, bandoreke neteweyî ya civakî û dîrokî li ser çar parçeyên Kurdistanê kiriye, Kurdên çar parçeyên Kurdistanê anîye ber hev û bi taybetî jî bi serokatîya Mîstefa Barzanî, kurdên başûrê Kurdistanê bûne hêzeke girîng a parastin û leşkeriya Komara Kurdistanê. Nûnerên Bakur û Rojavayê Kurdistanê jî di vê pêvajoyê de cih girtine. Divê ev roj, her sal ji aliyê hemû kurdan ve bête bîranîn û pîrozkirin. Ewên ku temenkurtiya Komarê û kêmaniya coxrafya di bin serweriya Komara Kurdistanê de, wek sebebê piçûkxistin û herêmi mayîna Komarê nîşan didin, di rastîyê de girîngiya rûdana ragehandina Komarê tênegihîştine û herweha dixwazin îradeya ragehandina Komara Kurdistanê jî piçûk nîşan bidin. Eger em birawirdekê rûdanên dîrokî bikin; di dîroka têkoşîna civakî û neteweyî de, rûdana ragehandina Komana Parîsê, ji bo çepgirên dinyayê çiqas girîng be, bi tevî hemû kêmasîyên xwe ve, nîşandana îradeya ragehandina Komara Kurdistanê jî, ji aliyê neteweya Kurd ve ewqasî girîng

e. PDKÎ jî, partiya pêşeng û damezrêner a Komara Kurdistanê ye. Bêguman beriya PDKÎ; rêxistinên wekî “KAK” û “JK” jî hebûn û wan jî di vê pêvajoyê de cih girtine. Dema ku em vê pêvajoya dîrokî ji nû ve binirxînin û basa bandora PDKÎ ya li ser hişyarkirina neteweyî bête kirin, wek partiya pêşeng û damezrênera Komara Kurdistanê, em dikarin bibêjin ku li çar aliyên Kurdistanê bandoreke pirr girîng li ser peydabûn û geşbûna hişyariya neteweyî kiriye.

P: Pêwendîya Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê digel partiyên din ên Kurdistanê mezin çawa bûye?

B: Pêwendiyên siyasî û neteweyî yên Rojhelatê Kurdistanê bi parçeyên din re, ji salên 1880ê yê dema tevgera Şêx Ubeydullahê Şemzîni ku piştgirîyek mezin ji kurdên Rojhelatê Kurdistanê girtibû dest pê kirîye; beşeke girîng e tevgerê li Rojhelatê Kurdistanê pêkhatibû. Tevgera bi serokatîya Simkoyê Şikak û di sala 1928an de Tevgera Agirî û heta damezrandina Komela “JK”ê

»»» Doma R:4

û pişt re jî PDKÎ, em dikarin bibêjin ku pêwendiyên wan ên siyasî û neteweyî ji van salan bigre heta îro hatîye. Di destpêka sala 1914an de, şanda ku pêkhatibû ji Şêx Evdiselam Barzanî, Simkoyê Şikak û Ebdurezaq Bedirxan bi hev re bi navê şanda Kurd serdana Rûsiyayê kiribûn û ji nûnerên Rûsya daxwaz kiribûn ku piştgiriya tevgera neteweyî ya Kurdistanê bikin.

Em weha dizanin ku pêwendiyên bi başûr re jî bihûrîya wê digîje dema Şêx Ebduselam û paşê Şêx Mehmûd û dema Komara Kurdistanê jî bi Mîstefa Barzanî û hevalên wî ra berde-wam dike... Ji xwe bihûrî Partî Demokrat a Kurdistanê Îraqê PDKÎ jî digîje salên damezrandina Komara Kurdistanê, salek piştê PDKÎyê li ser atmosfer û hêvênê îra-daeya ragehandina Komara Kurdistanê hatiye damez-randin. Ev her du partî jî, berhema îradeya ragehandina Komara Kurdistanê ne. Ji rûxandina Komarê şûn ve, darvekirina Pêşewa Qazî Mihemed û hevalên wî, ji bo PDKÎ û tevgera neteweyî ya li Rojhelatê Kurdistanê bûye darbeke mezin û li Rojhelatê Kurdistanê heta destpêka salên 1960î lawazî û bédengîyek çêbûye. Piştî vegera Barzanî û hevalên wî ji Yekîtiya Sovyetê, bandoreke pirr girîng û erênî li ser her çar parçeyên Kurdistanê kiriye. Herweha pêkha-tina peymanê 11ê Adarê li Başûrê Kurdistanê, bêtir bandor xistiye ser tevgera neteweyîya Rojhelatê Kurdistanê û di sala 1973an de bi serokatîya Dr. Ebdulrehman Qasemlo, têkoşîna PDKÎ ketiye di nava pêvajoyekî nû. Hervîsa Dr. Ebdulrehman Qasemlo, bi havêna îradeya Komara Kurdistanê çê bûbû û perwerdeyiya xwe jî li Ewropayê girtibû. Ew di destpêkê de, ji ber pêla bayê demê, li ser xetek çepgirî meşyaye û piştî tecrûbeya bûyerên salên şêstî, li ser zemîneke neteweyî ya Kurdis-

tanî berê xwe daye xeta sos-yal demokrat. Vê perspektîfê asoya siyasî û pêwendiyên neteweyî yê PDKÎyê firehtir kiriye û tîkiliyên digel rêx-istinên parçeyên din ên Kurd-istanê jî geştir kirîye. Ji nû ve nirixandina Şoreşa Îslamî ya Xomêynî û pêvajoya salên 1979an, babetek dî ye. Lê em dibînin ku di vê pêvajoyê de jî pêwendî geş û berfireh bûne. Di sala 1991an de, piştî ewê ku gelê Kurd li Başûrê Kurdistanê çarenivîsa xwe bideştve girt, ji bo paraştina deştkevtiyên neteweyî û behane çênêkrina ji dewleta dagirker a Îranê re, hesasîy-etek girîng hatîye nîşandan û xebata çekdarî ya PDKÎyê hatîye rawestandî. Ev hemû mînak û gelek mînakên din jî didin nîşandan ku bi tevî hemû kêmaniyên xwe ve, pêwendîya bi parçeyên din re baş bûye. Di dema niha de jî ragehandin gehiştîye qonaxek gelek pêşketî, em di dema înternetê de ne û sînoren dewletên dagirker nikarin pêşî li pêwendiyên me bigrin. Em bi asanî dikar-in gav bi gav hev bişopînin. PDKÎ jî di nav de; divê hemû aliyên tevgera neteweyî û azadiya Kurdistanê karibin xwe nû bikin û ji potansiyela her çar parçeyên Kurdistanê îstifade bikin, li gor vê dema nû, pêwendîyan pêk binin û rêbazên nû ji bo pêşxistina têkoşîna neteweyî bic-eribînin.

P: Tu xebata nû ya PDKÎ li jêr navê “Rasan”ê çawa dinirxîni?

B: Di rewşa siyasî ya navneteweyî û herêmî ya îro de, li Rojhelata Navîn û Kurdistanê, di bin ronahî û pêşengîya siyaseteke neteweyî de, bi ruh û îradeya damezrandina Komarek nû, pêdivî bi têkoşîn û xebateke xurt û berfireh heye. Bêgu-man divê hemû cureyên xebatê û sehayên civakî bîne tijekirin û dagirtin. Di rewşa îro ya Rojhelata Navîn de, bi taybetî li meydana hêza te ya xwecihî û paraştinê tune be, li ser pîya mayin û bandor li civakê kirin nemimkun e. Di vê çarçoveyê de, çi dibe bila bibe, li ser erdê Rojhe-

latê Kurdistanê bicihbûna pêşmergeyan pir girîng e û divê ew her bête teqwiyekirin. Ji bo vê yekê astengiyên ku PKK dix-waze derxîne, ji berjewendiyên neteweya kurd re xizmet nake. Bêguman Kurdistan welatê hemû kurda ye, lêbelê divê berjew-endiyên neteweya kurd, li ser hemû berjewendiyên rêxistinî bêne qebûlkirin. Di sala 1945an de dema ku Barzanî derbasê Rojhelatê Kurdistanê bûn û tevî xebata damezrandina Komara Kurdistanê bûn, li gor îradeya siyasî ya Serkomar û serkir-dayetiya siyasî ya Komara Kurdistanê tevgeriyan. Îro PKK, di çarçoveya armanca siyasetek kêmnneteweyî/eqlîyatî de, dix-waze siyaseta Turkîyeyîbûn, Îranîbûn, Iraqîbûn û Sûryeyîbûnê bi neteweya kurd bide qebûlkirin. Di pratîkê de li gor vê tevdi-gere û mudaxaleyê îradeya siyasîya parçeyên din dike. Ev ne raşt e û ne li gor berjewendiyên neteweya Kurd e.

Ku em ji nû ve vegerin li ser bersiva pirsê we, qasê ku em dişopînin xebata bi navê Rasan, xebateke pirralî û pirrengî daye ber xwe. Eger bi vê rêbazê, karibin dînamîzm û tecrûbeya beşên cur bi cur yên civaka kurd û rêxistinên din bi rêk bixin, hêz û enerjîyek pirr girîng derdikeve holê. Ji ber vê yekê, rêx-istin û serkevtina xebata Rasan pirr girîng e.

P: Xebata Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, çi bandorek li ser hevkêşeyên siyasî yên Kurdistanê mezin daynaye?

B: PDKÎ; partiya damezrêner a Komara Kurdistanê ye, partiya Pêşewa Qazî Mihemed e, xwedî tecrûbeya siyasî û neteweyî ya 75 salan e û bêguman bandorek wê ya girîng li ser hemû girûpên siyasî yên kurd heye û bawer dikim bi vê tecrûbeya 75 salan, dê bandora wê li ser hevkêşeyan partî û girûpên din erênî be. Bawer dikim bi rêxistinên Bakurê Kurdistanê re hevkêşîya herî girîng, bi PKK/PJAKê re ye. Dîtina min ev e; PKK siyasetek kêmnnetewî dimeşîne, xwe wek rêxistînek Turkîyeyî dibîne, dijî mafê çarenivîsî û serxwebûna Kurd-istanê ye, ji ber vê yekê divê bêşert û bêmerc deştê xwe ji parçeyên din ên Kurdistanê bikşîne, astengî û zehmetiyan ji rêxistin û deştihilatdariya wan re dernexîne. Eger ku PKK siyaseta tedaxula karûbarê navxweyî yê parçeyên din berde-



wam bike, dê bibe sedemê sereke yê peydabûna biraku-jîya neteweya Kurd çawa ku berîya niha mînakên wê hatine dîtin. Partî û girûpên din ên Kurdistanê Bakur jî, berdewamî vê siyaseta PKKê rexne dikin. Di vê mijarê de, helwest û siyaseta PDKÎyê raşt û erênî tê nirixandin. Bi minasebeta 75mîn salvegera

damezrandina PDKÎyê; şehîd Qazî Mihemed, Dr. Qasimlo, Şerefkendî û Qaderî bi rêzgirtînek gewre bi bîr dihênim, pîrozbahî li serkir-dayetî û hemû xebatkarên partîyê dikim û hêvîdarim ji bo dahatûya nêzîk amadek-arîyek baş çêbe û fersendeke nû ya wekî 1946an û 1979an ji deşt neçe.

Hevpeyvînek li derheq 75emîn salvegera avakirina PDKÎ, digel Şarezayê Dîroka Kurdan û Nivîserê Bakurê Kurdistanê Mihemed Heseko



Mihemed Heseko (birasoz): PDKÎ 75 sal in her û her piştevanî ji mafên gel û welat kiriye û her li ser pêvajoya rizgarîxwaza Kurd bi serbilindî wê tê bikoşe.

Hevpeyvîn: Keyhan Mihemedînîjad

P: Gelo Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, di serdema avabûna xwe de çiqas hewce bû bo daxwazên neteweya Kurd?

B: Di deştê pêkê de, salvegera damezrandina Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê (PDKÎ), li gelê Kurd bi giştî û li gelê Kurd li Rohilatê Kurdistanê bi taybetî pîroz dikim, herwiha pîrozbahiyê li serkirdayeti, Pêşmerge, malbatên şehîdan û dost û alîgirên PDKÎ ê dikim, herwiha silav û rêz bo hemû damezrêneran û bi taybetî Pêşewa Qazî Mihemed û bejna xwe ji bo pakrewanên PDKÎ dite-wînim.

Derbarê pîrsa cenabê te, erê damezrandina PDKÎ wek yekem partiyekî siyasî di dîroka Kurdî de hatiye tomarkirin û pêwîstîyeke girîng bû, ji ber ku ew pêngav piştî gelek bizavên gelê Kurd ji bo bideştveanîna maf û daxwazên neteweyî li her çar parçeyên Kurdistanê hat, ji şoreşa Şêx Ubeydullahê Nehrî di sala 1879'an de li Bakurê Kurdistanê ku bi yekem şoreşa Kurd ya Netweyî tê nasîn û paşê şoreşa Şêx Seîdê Pîran, Şêx Mehmûdê

Hefîd li Başûrê Kurdistanê û şoreşa Simkoyê Şikak li Rohilatê Kurdistanê, lewra damezrandina PDKÎ temamer an xelekeke ji zincîra xebata rizgarîxwaza gelê Kurd bû û wek karvedaneke erênî û rengvedaneke zaniştî bû li gor zaniştî siyasî, ji bo ku bi deştveanîna mafên gelan û pêkanîna armancên gelan tenê bi rêya rêxistin û partiyên re tê kirin, da ku ew rêxistin nûneratiya gel bik û bibe reng û dengê gel, ew jî bi rêya xwendina rewşa siyasî ya herêmî û ya navdewletî û zanîna fakterên serkeftinê.

P: Gelo PDKÎ bi avakirina Komara Kurdistanê, karî bibe bingeha nasyolizma Kurd?

B: Piştî şikestîxwarnên şoreş û serhildanên Kurdî li Bakur û Başûrê Kurdistanê, ku evê yekê bandoreke nerînî û bêhêviyek xistibû ser derûna Kurd, lewra ragihandina avakirina Komara Kurdistanê di sala 1946'an bi serokatiya Pêşewa Qazî Mihemed gelek hêvîbexş bû û vejîneke bihêz bû ji heşt û ramana neteweyî ya Kurd re, û divê ji bîra me neçe peyva pîroz ya Pêşmerge di hêlîna Komara Kurdistanê ji dayîk bû, herwiha wêstgeheke ku mirov dikare gelek pend û şîretan di hemû warên rêvebriyê de jê werbigre, tevî temenê wê ku kêmtir ji salekê bû.. mixabin, lê xizmetek sêcar bêtir ji temenê xwe pêşkêşî civaka Kurdî kir.

P: Gelo Partiya Demokrata Kurdistanê Îranê û rêberên wê heya çî qasekê xwe erkdar zanîn bona gihandin dengê neteweya Kurd li derveyî welat?

B: Ev warê ku di pêvajoya xebata siyasî de gelek girîng û pêwîst e wate warê diplomasi ye. ji ber rol û bandora kar û pêwendiyên diplomasi, PDKÎ û rêberên wê girîngîyeke baş dan vî warî û leheng û pêşnegê vî warî bê guman siyasatmedarê kurdperwer şehîd Dr. Ebdulrehman Qa-

simlo ye, ji ber ku Dr. Qasimlo baş zanîbû ku damezrandina pêwendiyên bi aliyên navdewletî re wê doza gelê xwe yê rewa bi wan bide nasîn û herwiha hevaldoştan û piştigiran ji dozê re peyda bike, û ji ber rola Dr. Qasimlo ya bi bandor karîbû gelek dost û hevalan ji doza Kurdî re peyda bike, rejîma Îslamî ya Îranê ya faşîzim û xwînrij ev yek bi tirsna dît ku doza Kurdî bi xwediyê alîgir û doet û pişgîrên navnetewê, lewra pîlan



darêst bo şehîdkirina Dr. Qasimlo û piştî şehîd Dr. Sadiq Şerfgendî, û ew pêvajoya berdewam e, PDKÎ bi rêya çalakîyên salane û helkeftên Kurdî re ku li derveyî welêt lidar dixîne, him rejîma Îslamî ya Tehranê riswa dike û him jî pêwendiyên dostane digel kesatî û rêxistinên biyanî ava dike û dengê êşa bindestiya gelê Kurd bi cîhana şarîstanî dide bihîştin.

P: Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê 75 sal beriya niha hate avakirin, gelo tu xebata PDKÎ li derheq parastina keramet, paraştina mafê mirov û xebata li dijî serkurtkarî, ji deştê pêka avabûna wê ve heya niha çawa dinirxînî?

B: Eger mirov pêvajoya xebata PDKÎ bişopî e, wê bizanibe ku ev partî ji roja damezrandina xwe ve, ji ber ku bi armanca paraştina rûmet û mafên mirovên Kurd hatiye damezrandin û ji bo bideştveanîna mafên rewayên gelê Kurd hatiye damezrandin, ti carî ji bîr û baweriyên xwe paşve nekişiyaye, û li hemberî siyastên dijminaneyên rejîma Tehranê ya faşîzim û kiryarên hovane bi zîndanîkirin û bidarvekirina xebatkaran li hemû qadên Rohilata Kurdistanê xebataq xwe dimeşîne û her berdewam e. Partiya Pêşewa Qazî Mihemed û şehîd Dr. Ebdulrehman Qasimlo û şehîd Dr. Sadiq Şerfegendî,

û ev temenê dagirtî ji xebat û têkoşînê û herwiha bi qurbanîdanê, wê ti carî li hember dijmin û neyarên gelê Kurd paşvekişî nekiriye, û wek çawa bû 75 salin her û her piştevanî li mafên gel û welat kiriye û her li ser pêvajoya rizgarîxwaza Kurd bi serbilindî ve wê tê bikoşe.

P: Bi hilkefta 25'ê Gelawêjê 75emîn salvegera avabûna PDKÎ, tu bi giştî Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê çawa nas dikî û nerîna te di vê derheqê de çi ye?

B: Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, partiyekî xwedî xebateke dûr û dirêj e, partiyekî hatiye damezrandin bo bideştveanîna mafên rewa yên gelê Kurd û di vê mijarê de bi dirêjahiya 75 salan pêbend bû bi prensîbên xwe û partiya şehîdan û qurbanîdanê ye, xizmetkarê xelkê xwe ye, dilsozê gel û doza xwe ye, partiyekî xwedî nerîn û şiroveyên diruşt e ji rewşa siyâsî re.

Tevî pîrozbahiyê deştîxweşî û spasiya mamoste Mîstefa Hicrî Lêpirsyarê Giştî yê PDKÎ û serkirde û hemû endaman û alîgirên PDKÎ dikim, bû berdewambûn di xebatê de bo azadiya gelê Kurd, û bi wêrekî û bi dilsozî pêvajoya pêşngên xwe dimeşînin. Serkeftinê ji PDKÎ re dixwazim û bijî Pêşmerge, bijî Kurd û Kurdistan.

Partiyek siyasî û bizaveke neteweyî a mafxwazane



N: Elî Munezemî

Partiya Demokrat a Kurdîstanê ku partiyek siyasî û şoreşger e, li ser xîmê “Komeley Jiyanewey Kurd” di 16ê Tebaxa 1945an de hate damezirandin. “Komeley Jiyanewey Kurd” ku bizavek siyasî-neteweyî bû, di 1942an de pêkhatibû. PDKÎ di pêvajoya xebata xwe de bo sê armancên sereke têkoşîn kiriye: bideştveanîna mafê neteweyî yê gelê kurd, demokrasî û dadperweriya civakî. Di wê gotarê de emê bi kurtî bas ji wan her sê armancan bikin.

Mafê neteweyî: Partiya Demokrat her di deştpeka têkoşîna xwe de, xwe domderê xebatên rizgarîxwazî yê neteweyên Kurdan yê berî xwe dizane û armanca wê realîzekirina îradeya neteweyî di şeweya curek ji bideştvegirtina mafê çar-enivîsê de rengvedaye. Ew armanca li hemî dîroka wê partiyê de serekîtirîn pişk ber dikeve û eger serdemekê bas li şeweyên din yê mafê neteweyî (wek mînak: otomî) dihate kirin, ew yek tenê pêlekana yekemîn bû bo gihîştin bi mafê netewî. Eva ku rêberê xwedî hizrê Kurd, Dr. Qasimlo digot: “Siyaset hunera mumkin e û em xebatê dikin ku tiştekê werbigrin û piştê dîsa emê xebatê bikin ku tiştek zêdetir werbigrin”, tenê wê wateyê dide ku PDKÎ 75 sal e derheq mafê neteweyî xwediyê yek felsefe û ramana neguherbar bûye ku ew jî xebat bona bideştveanîna mafê netewî û rizgariya Kurdîstanê ye.

Demokrasî: Demokrasî bo PDKÎ armanceke çendalî ye. Li hêlekê ew her wek Dr. Qa-

simlo dibêje: “Altirnatîve bo çekê”. Eger demokrasî nebe, aştî nikare serbikeve û mirov neçar e bo parastina xwe, çekê bigre deşt.

Demokrasî parêzvanê mafê neteweyî ye. Jiberku eger demokrasî nebe, dîktator û dagîrker dikarin dîsa li dema bihêzbûnê de bibin gef û tehdîd li ser maf û hebûna neteweya kurd.

Demokrasî bo PDKÎ çeka parastina tenahiya hundirîn a civaka Kurdîstanê ye ku li rêka sîstemek demokratîk de deng û reng û ramanên cuda bikarin bi azadî di qata siyasî de bikevne rikeberî û nûnerên rastîn ê xelkê bi rêka hilbijartinên azad ve deştihilatê bigrin deşt xwe û xelk û partiyên siyasî ew hêza hebin ku bandorê li ser biryarên siyasî çêbikin. Her li ber wê yekê ye ku Dr. Qasimlo “xirabrîn demokrasîyê li baştirîn dîktatoriyê bi baştir dizane».

Demokrasî herwisa sinorê navbera «azadiya erênî» û «azadiya nerênî» deştîşan dike û dide eyankirin ku sinorê herêma jiyana xasmaniya hemwelatîyan kîdere û îznê nade ku deştihilatdar deştêwerdana wê herêmê bikin.

Dadperweriya civakî: PDKÎ her tim bo nehêlana naedalefî û nedadperweriya civakî xebat kiriye. Armanek ku li ser bingeha nirxa mirovan hatiye danîn û mirovan xwe bi xwe armanc û xwediyê nîrxê dizane û dijî bikaranînan mirovan e bi deştê mirovan bo berjewendiyên xwe. Ew dadperwerî bo wê yekê ye ku karameta merivan were parastin. jiberku sîstîmek ku xwe demokrat bizanibe, dibe dadperwer be jî. Yanî yek ji armancên herî bingeîn yê PDKÎ, pêkanîna dadperweriyê ye di nava civakek demokrat de.

Rêyên xebatê: PDKÎ di heyamê jiyana xwe ya 75 salan de, li taktîk û rêyên cuda

cuda li têkoşîna xwe de bo gihîştin bi armancên xwe, mifah wergirtiye. Dr. Şerefkendî dibêje: “Bo xebatê çî zor e rê!” Lê eva ku PDKÎ li zaf partiyên din cuda dike, eva ye ku di wê xebatê de xwediyê prensîpên neguher û exlaqî ye. Ew cehdê dike ku endamên xwe ne tenê bi canê şoreşvanî, lê herwisa bi exlaqê şoreşvanî perwerde bike. Ew yeka bûye sedem ku pêşmerge û endamên wê partiyê, di rewşên aloz û dijwar de jî, bi durîştî tevbigerin û xwe di hember kiryarên xwe de bi berpirsiyar bizanin. Bo mînak, di xebata xwe ya çekdarî de, pêrewê prensîpên “şerê rewa” ne û ne tenê di hember canê hevvelatîyên Kurdîstanê û pêşmergeyan de, lê di hember leşkerê dijmin de jî xwe berpirsiyar dizanin û eger bo parastina xelk û canê xwe nebe, naxwazin bikevin şer de.

Di xebata ragehandinî û axavtinên siyasî de jî, exlaq berçav digrin û heta li dijî dijminê xwe jî, bi edeb ve dinivîsin û diax-



ivin. Dr. Qasimlo dibêje ku “em gef û dijûnan red dikin û em yekemîn partiya Îranî û Kurdîstanî bûne ku me exlaq aniye nav siyasetê”.

Xebata dîplomatîk: PDKÎ tim xebata xwe ya dîplomatîk de, ne bo partiyê, lê bo berjewendî û qazanca neteweyî dixebite. Ew pîrsa kurd bi pîrsa neteweyek 50 milyonî dibîne û welatê wan hatiye perçekirin û xelkê wan ji aliyê dagîrkeran ve tê qirkirin û mafê wan yê mirovî nayê parastin. Ew di xebata xwe ya dîplomatîk de hemû saziyên neteweyî ên Kurd, bi xebatkar û mafxwaz dibîne û hebûna hizr û ramanê cuda cuda, nabin asteng û li ser berevanîkirin li xebata gelê Kurd li çî perçeyekê.

Encam:

PDKÎ di heyamê 75 salan xebat û têkoşîna xwe ya neteweyî de, wek partiyek neteweyî-demokratîk, bo rizgariya xelk û axa Kurdîstanê xebitiye. Di wê xebatê de nîrxên mezin dane, lê li ser têkoşîna xwe li hemû demê zêdetir pêdagir e. PDKÎ xebata neteweyî di hemû perçeyên Kurdîstanê de, bi xebata gelê xwe dizane û piştgiriya exlaqî-neteweyî li partiyên şoreşger û neteweyî di hemû Kurdîstanê de, bi erk û xebata xwe dizane. Di 75emîn salroja jidayikbûna wê partiyê de, em bo ruhê şehîdan, pêşmerge û hemû xebatkaran re silavan dişînin û serkevtinê bo xebata me ya neteweyî re dixwazin. PDKÎ wek pêşengê wê xebatê, li hemû dema bihêztir û serkevtitir be.

Sûriya ji nexşeyeke naskirî ber bi nexşeyên nediya



N: Sabri Rasoul

Krîza Sûriyê niha çareser nabe, ku ti seqayeke navdewletî ya guncayî nîne, û tiştê dibe û rolên heyî li gorî têgihiştin û rêkeftinên herêmî tene dabeşkirin, û derfet gelekî kêr in û peyda nabin, û hêzên navnetewî nêzikî ti çareseriyêke aştiyane nabin.


Piştî sal û nîvekî ji destpêkirina xwepêşandanên ceme-warî yên rûdayîn di destpêka 2011'an de li dijî diktatoriya rejîmê û şemkariya wê li hember miletê Sûriyê, ku textê Şamê hate hejandin û tirs ket dilê dewletên cîran de, heta di dawiya 2012'an de, ku guhertineke mezin hate pêş û tê de milet destpêşxeriyê xwe di arastekirin û serkêşiya bûyeran de ji dest da, û hêza wê ya mezin ber bi hêzên biçûk, ne yekgirtî û berbelav çûn û nakokiyên ew şikandin û bi hêzên derveyî ve hatin girêdan, û Sûriya bû meydana destlêwerdana hêzên terorîstî yên herêmî wekî Hizbullah, Pasdar û ISIS, û rejîma Sûriyê karî wan bikar bîne bi baştirîn şêwe ji bo serkutkirina serhildana gelê Sûriyê, hevdem ku hin welatên herêmî ji bo heman armancê wekî Qeter û Tirkîyê destê xwe avêtin qada Sûriyê, lê guhertina herî mezin di sala 2015'an bi leşkerkêşiya Rûsî dest pê kir, nemaze bikaranîna çekên qurs û giran ji bo sepandina desthilata rejîmê li ser gelek navçeyan ku ji berî destlêwerdana Rûsî bi tenê sêyek ji rûberê Sûriyê di bin destê wê de ma bû, û bi vî yekê her tişt berevajî bû, û milet bêhêvî bû ji pêkanîna xewna guhertineke realîst.

Êdî rejîma Sûriyê nekarî

digel millet bijî û dest bi kuştin û komkujiyan kir ji bo tolstandin û sizakirina millet bi hemû hêza xwe, û hêzên miyanrê “nerm” lawaz bûn û ketin di bin sîber û fermana herdu rêxistinên terorîst (ISIS “al-Bexdadî” û Nesra “al-Colanî”) de.

Eha . . . ji vî derê mirov dikare bêje ku dewleta Sûrî, bi tevî nexşeya xwe ya “erdnîgarî û siyasî” tîk çû, û dîtir nema, û dîtir siberoja Sûriyê dê ne wek berê be, kar û pergala wê ya siyasî jî dê cuda be !. Nexşeyên biçûk wê bibin alternatîf û dê şûna nexşeya Sûriyê ya kevin bigirin, ew nexşe tîk û wê bîr sepandin bi şert û mercên nû ji hêla hêzên çalak ve yê li ser qada Sûriyê, digel hez û xweşta hêzên navdewletî yê heta niha nehatine holê.

Gava mirov digehe wê baweriyê ku Sûriya nû dê ne wekî Sûriya berê be, mirov dizane ku miletê Sûriyê li ser çend komên berevajî û dijberê hev dabeş dibe, û hevdem ku wan ti serbixweyiya siyasî di nêrîn û helwestên xwe de nine, û ku berjewendiyên wan ji terzîkirin yan ji pînekirina nexşeya Sûriyê ya “erdnîgarî û politîk” girîngtir e, tevî ku mirov dizane ku pêkanîna lihevhatinekî di navbera “Ereb û Kurd û pêkhatiyên olî” de karekî hêsan nîne, û herwiha jî ku nivîsandina destûrekî “makezagon” li gorî daxwazên gelên Sûriyê ji bo pêkanîna dadmendî û serweriya dadrêsî û parastina mafên netewî yê gelê kurd dîtir bûye aşop û xewneke şêrîn ya xelkê me.



“Gridlock” û qeyrana mirovî û aloziya rewşa jiyanê, digel belavbûna tawankariya organîzekirî, bû hokarek ji bo ku hêzên siyasî li hin navçeyan car car bikevin di nav hin diyalogên demkî û kurt de, ji bo avakirina hin hevpeymaniyên siyasî ji bo parastina hêvî û destkeftên mayî, wek diyaloga di navbêna Encûmena Niştîmanî ya Kurd (Enks) û Partiya Yekîtiya Demokrat (PYD) de, tevî ku heta niha ti encamên berçav nehatine bidestxistin, di heman dem de ku ragihandina “Eniya Aştî û Azadiyê” di dawiya Tîrmehê de di navbera Encûmena Niştîmanî ya Kurd, Rêxistina Asûrî ya Demokrat, Rewta Pêşerojê ya Sûrî û Encûmena Erebên Ferat û Cizîrê de, hat wekî bersivdanekî li ser rewşa “gridlock” a siyasî ya giran, herwiha wekî encam ji rewşa niha re di çarçoveya lêgerînan de yê ji bo dîtina çareseriyêke siyasî li Sûriyê û avakirina binyat û pîrnsîpên pêkvejiyana hevbeş di navbera pêkhatiyên navçeyan (Rojhilata Firatê) de.

Êdî li vir; mirov dikare bi kurt û kurmancî bêje ku nexşeya “siyasî û erdnîgarî” ya Sûriyê ti binyatên hebûna xwe yê bi rastî li ser erdê nemane, û hêdî hêdî hin nexşeyên nû wê bîr nexşe û nîgarkirin, nemaze piştî ku nexşeya Sûriyê kevin û genî bûye û kefîz girtiye, hevdem digel zalbûna boçûna wêrankariyê li ser hiş û asoyê siyasî yê rejîma Sûriyê!.

Wergerandin: Ebdulezîz Qasim

Di heyamê 10 salan de, 1360 kolber ji aliyê hêzên rejîmê ve hatine kuştin û birîndarkirin

Navenda amar a Ajan-sa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê, amarek belavkiriye ku ji destpêka sala 1390an heya meha Gelawêj a îsal 1399an, serhev, hezar û 360 kolber hatine kuştin û birîndarkirinê

Pêka wan amaran, ji wan hezar û 360 kesian, 469 kes hatine kuştin û 864 kes jî hatine birîndarkirin.

Ew amare dide xuya ku %79 a kolberên ku hatine kuştinê, bi teqeya rasteraşte hêzên rejîmê ve bûne û %6 bi sedema teqîna mîn û sir û sermayê bûne herwisa %4 bi sedema kevtina ji bilindahiyê û 11 kes jî bi hegerên dinê hatine kuştin û birîndarkirin.

Ji wan hezar û 360 kolberan, 18 kes temenê wan kêmtir ji 18 salan bûye.

Çawaniya kuştin û birîndar-



bûna wan kolberan wiahaye:

Hezar û 20 kolber bi sedema teqeya rasteraşte hêzên rejîmê

73 kes bi sedema sir û serma û reniyê

73 kes bi sedema teqîna mînan

54 kes bi sedema veresiyan ji bilindahiyê

36 kes bi sedema şimitîn bo

naw Av a çeman di dema revîn ji destê hêzên rejîmê

6 kes bi sedema lêdan û îşkenceya ji aliyê hêzên rejîmê ve

11 kes bi sedema teqeya hêzên Tirkîyê

12 kes bi sedema rawestiyana dîl di dema kolberiyê de

1 kes bi sedema ketin di bin bar de

5 kes bûserûşûn

1 kes qet`ia nixa`ê

1 kes bi sedema fetisînabi bi gazê di naw xêvetê de

6 kes bi sedema topbaranên rejîma Îranê li ser sînoran

4 kes bi sedema bombebarana balafirên Tirkîyê di ser sînoran

3 kes bi ji aliyê rejîmê ve bi deset û pêyên girêdayî ji bilindahiyê ve havêtine xwarê

53 kolber jî di dema kolberiyê de raştî bûyerên hatûçûyê bûne û birîndar bûne.

1 kolber jî bi sedemekî neron, canê xwe ji deset daye.

Ew amar ji aliyê rêkxistina “Kurdpa”ê ve hatiye amadekirin û weşandin.

Du hepsiyên siyasî di girtîgeha bajarê Urmîyê de bo cihekî nexuya hatine veguhaştin

Roja Sêşemî 14`ê Gelawêj, “Îbrahîm Xelîl Sidîqî Hemedanî” û Rkure wî ê bi navê “Salar Xelîl Sidîqî Hemedanî” du hepsiyên siyasî di girtîgeha bajarê Urmîyê li benda “Ravêj” a wî girtîgehê bo cihekî nexuya hatine veguhaştin.

Çavkaniyeke agehdar di girtîgeha bajarê Urmîyê de bi Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê re ragihand: Ew du hepsiyên siyasî roja Duşemî 13`ê Gelawêjê ji derheq nerizayetiya rewşa xirab a girtîgehê di benda “Rewan dermanî” bo benda “Ravêj”ê hatine veguhaştin.

Herwisa wê çavkaniyê got: Ew du hepsiyên siyasî çend caran ji derheq nerizayetiya rewşa xirab a girtîgehê dest avêtine nerizayetiye û herwisa carekê jî bo veguhaştin bo benda hepsiyên siyasî dest avêtibûn bi girevgirtinê.

“Îbrahîm Xelîl Sidîqî Hemedanî” û du zarokên wê yên bi navên “Salar û Meryem Xelîl Sidîqî Hemedanî” di rêketa 4`ê Reşemeya sala 1397`an di bajarê Urmîyê de ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine binçavkirin û piştî du mehan lêkolîn di girtîgeha îdareya îtila`at a bajarê Urmîyê de bo girtîgeha navendî a wî bajarî hatibûne veguhaştin.

“Meryem Xelîl Sidîqî Hemedanî” di rêkevta 5`ê Banemer a sala 1398`an bi danîna barimteya 250 milyon tumenî ji girtîgehê hatibû azadkirin.

27`ê Xermanan a sala 1398`an, “Îbrahîm û Salar Xelîl Sidîqî Hemedanî” di taya du a dadgeha şoreş a bajarê Urmîyê de hatine mihakimekirin û bi tohmata “endambûn digel saziya Mucahidînê Xelq” her yek ji wan bi 15 sal hepsa te`izîrî û bi



tohmata “piropagende dijî nizam”ê bi yek sal hepsa te`izîrî hatibûne cezadan. Ew du hepsiyê siyasî piştê ji aliyê taya 3 a dadgeha şoreş a bajarê Urmîyê bi tohmata “girtina film ji navendên leşkerî” her yek ji wan bi sê sal heps hatibûne cezadan.

Cezaya ku bi ser wan du hepsiyên siyasî de hatibû sependin bi piştgirêdan bi madeya 134 a yasaya cezayên îslamî, bo her yek ji wan 15 sal tê cîbicîkirin.

Kemanjenê Kobanî Mihemedê Dûman koça dawiyê kir

Hunermend û kemanjenê navdar ê Kobanî Mehemed Xelîl Xazî yê bi navê Mihemed Dûman naskirî ye, îro li Enqerê koça dawiyê kir.

Şêxê kurê hunermend û kemanjen Mehemed Xelîl Xazî ji K24ê re ragihand, bavê wî îro li nexweşxaneyê Enqerê di 91 saliya temenê xwe de koça dawiyê kir.

Kemanjen Mihemedê Dûman bi dengbêjên navdar ên Rojavayê Kurdistanê wek Baqî Xido û Cemîl Horo û yên din re li kemanê dida.

Herwiha da zanîn jî, Mihemed Xelîl Xazî di sala 2014an de, di dema êrîşa çekdarên DAÎŞê de, ji Kobanî koçberî Tîrkiye bûbû.



Mihemed Xelîl Xazî sala 1929ê li Sêwrega Rihaya Bakurê Kurdistanê ji dayîk bûye, lê malbata wî bi eslê xwe ji pirdêya Başûra Kurdistanê ye. KURDISTAN24

Hunermend Mihemed Elî Şakir: Koçberî birîneke kûr e

Yekemîn cejina qurbanê li ser hunermenê navdar Mihemed Elî Şakir deras dibe û ew koçber e. Şakir dibêje, birîna koçberiyê zor e û ji ber sedema dûrbûna ji Serê Kaniyê ew nexweş bûye. Êşa koçberiya bi zor pir mezine, lê ji bo kesekî hunermend, koçberî birîneke kûr di dilê de ye.

Rewşa hunermendê navdar Mihemed Elî şakir di keser û eşên di awaz, şîran û gotinên wî de diyar dibe. Hunermendê ku ji nêzî 10 mehan ve ji Serê Kaniyê Koçberî Amûdê bûye dibêje, tevî ku ev ne cara yekemîn ku koçber dibe, lê êşa vê carê



cuda ye û pir mezin e.

Mihemed Elî şakir gelek berhemên girêdayî êş û boneyên şahiyê yên Kurdan li her 4 parçeyên Kurdistanê çê kirine û berhema wî ya dawî li ser bajarê Serê Kaniyê ye.

Hunermendê ku di sala 1968 de deşt bi hunerê kiriye, dibêje hunermend heştîyar in û bi hemû bûyer û boneyên netewa xwe bandor dibin.

Mihemed Elî Şakir ku ji xelkê Dirbêsiyê ye, piraniya jiyana xwe li Serê Kaniyê derbas kiriye, lê piştî kirîza Sûriyê ev cara duyemîn e ji mal û warê xwe koçber dibe.

Hunermend Mihemed Elî Şakir ku piraniya berhemên hunera xwe û alavên muzîkê li paş xwe hiştine dibêje, îro ji ber çekdarên bajarê wî dagîr kirine, jiyana wî bê wate maye. KURDISTAN24

Seydayê Tîrêj dildarê zimanê Kurdî û axa Kurdistanê bû

Seydayê Tîrêj helbestvanekî Binxetê yê dîlnazik û welatperwer bû. Piraniya helbest û berhemên Tîrêj, qadeke zengîn û berfireh a nîşandana fikr û ramanên neteweyî, welathezî û yên girêdayî ax û xwezaya Kurdistanê bûn.

Xîreta neteweyî di dil û mêjiyê Tîrêj de di coş û kelecane de bû. Wî hebûn û qîmeta xwe bi hebûn û qîmeta welatê xwe ve girê dida.

Tîrêj dildarê zimanê Kurdî û axa Kurdistanê bû. Welat li ba wî tiştê herî pîroz bû di jiyana de, lewma di helbestên xwe de cih dida av û çemên Kurdistanê biherikin, çiyayên bilind diyar bibin.



Bi geştên xeyalî li hemû parçeyên welat û bajar û bajarokên wî digeriya, bi eşên Kurdan re digiriya, bi kêfên wan re şa dibû, pesnê şehîd û canfidayên Kurdan dida.

Tîrêj can û mal û milkê xwe bi qurbana welatê xwe dikir. Digot bê hebûna welat, em jî nînin.

Axa Kurdistanê li ba wî mîna

misk û emberê bû, ew herî zêde girêdayî ax û xwerîsta welatê xwe bû.

Di dîwana xwe ya duyem (Zozan) de, di helbesta li jêr navê (Ey Welat) de, Tîrêj wiha dibêje:

Ey welatim can bi gorî gazîna te j' min nebî

Tu dizanî bi şev û rojan ez

xemxwarê te me
Rêz û neqşê xameya min
navê tey şêrîn û xweş

Her wekî bilbil dinalim ez
pesindarê te me

Ez sura bayê siba me xumxuma av û çema

Ez dîroka ser devê millet û komara te me

Ger ku Tîrêj im bi rastî bîr û baweryam ev e

Ta bi mirnê ger ne wa bim ez gunehkarê te me

Seydayê Tîrêj an Nayifê Heso sala 1923an ji dayik bû û sala 2002an koça dawî kir. RUDAW

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

Spaha Pasdaran êrîş kire ser binkeyên Hêza Pêşmerge Kurdistanê

Roja Duşemî 13`ê Gelawêjê, binkeyên Hêza Pêşmerge Kurdistanê raştî êrîşa balafirên bê pîlot yên Spaha Pasdaran hatin.

Di wê êrîşa mûşekî de binkeyekî Hêza Pêşmerge Kurdistanê raştî ziyaneke madî hat.

Malpera fermî a Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê di vê derheqê de bilav kiriye, ku Pêşmerge Kurdistanê di silametiya tewav de ne û ti metirsiyekî canî li ser wan nebûye.

Berê jî roja Sêşemî 27`ê Cozerdan a îsal, topxaneyê Spaha Pasdaran deverên çiyayî yên navbera sînorên Herêma Kurdistan û Rojhilatê Kurdistanê li “Alanê” ku binkeyên Partiyên Kurdî yên dijberî hikûmeta Îranê li vir in, topbaran kir.

Di rêkevtê 3`ê Pûşperê de, “Kawe Behramî” Berpîrsê Dezgeha Fermandehî ya Hêza Pêşmerge Kurdistanê li bersiva gefên “Mihemed Pakpûr”, Femandeyê Hêzên Bejayî yên Spaha Pasdaran di hevpeyvînekê digel Ajansa Nûçegihaniya “Kurdpa”yê de ragihand: “Dê Hêza Pêşmerge Kurdistanê bersiva her cure êrîşên Spaha Pasdaran bide”.

Welatîyekî xelkê bajarê Kamyaranê ji aliyê hêzên ewlehî ve hate binçavkirin

Roja Çarşemî 8`ê Gelawêjê, hêzên ewlehî çalakvanekî medenî ê bi navê “Ferhad Ebdî” xelkê bajarê Kamyaranê binçav kirin.

Binçavkirina wî welatîyê, bi bê hebûna ti belgeyekî yasayî bûye û piştî bo lêkolînê bo girtîgeha îdareya îtîla`ata bajarê Sineyê veguhasîne.

Hêzên ewlehî “Ferhad Ebdî” di pirtûkfiroşîya wî de binçavkirin.

Ew çalakvanê medenî ji “pêwendîgirtina telefonî bi malbata xwe û destpêregihîştin bi parêzer” re hatiye bêparkirin. Heya dema belavkirina vê nûçeyê, ji sedema binçavkirina wî welatîyê Kurd ti zanyariyek ji ber dest de nîne.

Welatîyekî Kurd di encama îşkenceya girtîgehê de bo nexweşxaneyê hate veguhasîn

Roja Yekşemî 12`ê Gelawêjê, welatîyekî Kurd yê bi navê “Ceifer Husênzade” temen 49 salî kurê “Îsmail”û xelkê gundê “Serokanî” a ser bi bajarê Pîranşehrê bi sedema îşkenceyê di girtîgeha îtîlaata Spaha Pasdaran de, li nexweşxaneyê wî bajarê bo nexweşxaneyê Arifiyan a bajarê Urmiyê hate veguhasîn.

Pêka gotina çavkaniyekî agehdar, ew welatiye di girtîgeha îtîlaata Spaha bajarê Pîranşehrê de bi awayekî dijwar ji aliyê hêzên ewlehî ve kete ber îşkenceyê û rewşa tendirûştîya wî xirab e.

Herwisa wê çavkaniyê gok: “Ceifer Husênzade” di destpêkê de bo nexweşxaneyê bajarê Pîranşehrê hate veguhasîn û piştî bi sedema rewşa wî ya xirab bo nexweşxaneyê Arifiyan a bajarê Urmiyê hate veguhasîn.

Ew welatîyê Kurd roja Şemî 11`ê Gelawêjê ji aliyê hêzên ewlehî yên girêdayê Spaha Pasdaran ve hate binçavkirin.

Heya dema bilavbûna vê nûçeyê, ji sedema binçavkirina wî welatîyê ti zanyariyek ji ber dest de nîne.

Heyama hepsa welatîyekî Kurd hate zêdekirin

Di heyama çend rojên derbasbûyî de, biryara hepsa welatîyekî Kurd yê bi navê “Riza Remezanî” kurê “Îsfendiyar”, xelkê bajarê Kirmaşanê, bo heyama du mehên din hate zêdekirin û piştî bo girtîgeha Dîzilava a bajarê Kirmaşanê hate veguhasîn.

Roja Çarşemî 11`ê Pûşperê, hêzên ewlehî ew welatîyê Kurd bi tohmata vê ku di nav torên civakî de “bêrêzî bi pîroziyan” (Muqedesat)an kiribû hatibû binçavkirin.

Ew welatîyê Kurd bo lêpêçînê bo girtîgeha îtîlaata Spaha Pasdaran di bajarê Kirmaşanê de hetibû veguhasîn.

Di dema binçavkirina wî welatîyê Kurd de, dozgerê giştî û înkîlabî yê bajarê Şabadê, bas ji binçavkirina welatîyekî Kurd kir ku pêka gotina wî, navbirî “berpîrsê tora serekî ya meşa dijî dînê Îslam û koma dijî dîn” bûye.

Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat:

AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (379)



Yûbîla Elmas

*Ala 75 Sal Şanaziya Xebatê Ye Di Çepera
Partiya Demokrat A Kurdistanê Îranê De*

PARTIYA DEMOKRAT A KURDISTANA ÎRANÊ
DEZGEHÊ RÊKXISTINA GÎŞTÎ